


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 56 | 2013



Gundê Kelê (Kalebalta)





17

Tesîristin

Amedekar: Nesrîn Bayram



Çavkanî: Fatma Mert Sütcü ji Celebê

(Fata Mehmadî İboiyî Xezdalî)



8

Kurdên Anatoliyê li Amedê bûn

Muzaffer Özgür



43

Orta Anadolu Kürtlerinin Tarihteki izleri

Dr. Mikailî



56

Kalebalta Köyü/ Gundê Kelê

Ömer Yüce

www.arsivakur.com

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utgas av Apec Förlag AB

hejmar 56 | 2013

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksyonê

A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdogan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ates, Sefoyê Asê, Vahit
Duran, Mem Xelikan, Mustafa Mih, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress

Navnışana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet:

www.birnebun.com / www.birnebun.eu

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Bîha/Fiyati:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro


Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Îsveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyen li derveyî Swêdê / Îsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro–Stockholm/Sweden

SWIFT: HANDSESS

IBAN: SE07 6000 0000 0002 6588 5078



Gare Mert (ji mala Hika) Buka mala Bukiya - Gundê Bulduk

Her nîvîkar berpirsê nîvîsa xwe ye.

Mafê redaksyonê heye ku nîvîsen ji Bîrnebûnê re têñ, serrast û kurt bîke. Ger nîvîs çap nebin jî, li xwedîyan nayêñ vegeandîn.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Zîman li Almanyayê piştgirêñ kovarê ne.

Naverok

6	31
Jî Bîrnebûnê Ali Çiftçi	Sê Çirayên Geş Xizan Şilan
8	33
Kurdên Anatoliyê li Amedê bûn Muzaffer Özgür	"Ez qurban, bi kurmancî deng kirin çima súc û guneh dibe!" Seyfi Doğan
14	35
Belevoka Komîteya Îstîħlas û Îtîħad a Anatolî û Kurdistanê Amed Tigrîs	Nasname Ömer Faruk Hatipoğlu Wergera ji türkî: Nuh Ateş
17	40
Teşî ristin Amedkar: Nesrin Bayram Çavkanî: Fatma Mert Sütcü	Destanê Şêxbizin Xamgeli Bane
19	43
Li ser kurdî Adem Özgür	Orta Anadolu Kürtlerinin Tarihteki izleri Dr. Mikaîlî
21	56
Şopêñ dema xatîrxwaztinekê -IV Nuhê Hecî Malê Herşîd	Kalebalta Köyü/ Gundê Kelê Ömer Yüce
28	65
Çend Henek Mem Xelikan	Aksaray Kürtleri Zazacası -III Nêşîrvan Qîloñî
30	71
Helbest Seyfi Doğan	"Pontos Antik Bir Kimliğin Geri Dönüşü" Amed Tigrîs

Ji bîrnebûnê

Îsal di 14-19ê gulanê de li bajarê Amedê Pêşengaha Kitêban a çaremîn pêk hat. Wêşanxana me ji di pêşengehê de, bi du semîneran cih girt. Meha gulanê bi her awayî, xwazayıya xwe li bajarê Amedê dida xuya-kirin. Baraneka xweş dibarî. Îsal ne weke salên berê bû. Hewayeka xweş, dilgermiyek, rûkenî, hêvî û tevgerîneka din dixuya!..

Bi taybetî, ev mîvanperwerî, alîkarî û dilgermiya amadiyêñ ku bo me bibin alîkar, dest ji karê xwe berdabûn bo ku bêñ kitêbêñ me bigihînin ciyê pêşengahê, nas û dostêñ wek Beşîrê Têrikî, heval şîrikêñ wî û gelek kes û nasêñ din...

Hemû pêşengeh ciyêñ berhem danasîn û hevdu dîtinan in. Bi taybetî ya kitêban bo me kurdêñ Bakûr, li şûneka wekî bajarê kurdan ê qedîm maneyeka xwe ya din heye. Zimaneki ku ji teref dagîrkeran ve hatiye qedexe kirin, xwendin û nivîsandinê re îmkan nehatine dayîn, însanêñ bi vî zimanî deng dikin, bi darê zorê û bi sinorêñ ne xwazayı, ji hev hate ñutkirin, kesayetiya wan a kurd, nîfş bi nîfş hatiye ñîkar kirin, di rojeka wiha de hate ñutkirin, bi hev re danûstandin, ji nêz de hevûdu naşîn û guhdarî kirin û herwiha dîtina berhemêñ kurdî, ji bo min ciyê şanaziyeka bilind bû.

Çend balkêşiyêñ din ên wê pêşengeha îsal ew bûn; sembola pêşengehê bi çar herfêñ ku dewletê qedexe kiribûo hatibûn xemilan-din. Agahdariyêñ xwe her bi duzimanî, kurdî



(kurmançî/kirmançî) û tirkî bûn. Piraniya semîneran bi kurdî bûn.

Semînera li ser Kurdêñ Anatoliyê di pêşengehê de, bi tevlîbûn û baldarîyeka baş hat temâse kirin. Rojnameya rojane ku li Amedê bi navê *Güncel* derdikeve li ser semi-nerê û herwiha naveroka gotaran bi berfirehî, ji pînûsa Heci Gûneş cih girt.

Ev proseya nû ya diyalog û aştiyê di nav xelkê Amedê de tesireka erêni ya du-dilî hiştibû! Aramî û bi azadî pirsa kurdî bê çareserkirin hêviya wan bû! Lê baweriya bi dewletê anîn, her bi dudilî li ba piraniya hebû!

Mixabin, ev dudilî û gumana bi dewletê di nav kurdan de heye her ku diçe zêde dibe! Aliyê kurd ji bo ev aşti û aramiya ku peyda bûye, berdewam be gelek gav avêtine, lê terefê dewletê tu gavêñ berbiçav nehatine avê-tin. Van rojêñ dawî ev buyerêñ ku li Stenbolê û li Licê rûdan tesireka pir neyêni li pêvajoyê dike. Xuya dibe ku ne dewlet, bi rêvebiriya partiya AKPê, di bin serokatiya Recep Tayip Erdogan de, ne ji hêzên oposisyon(dijber)

ji bo çareseriya pirsa kurd û Kurdistanê ne amade ne.

Partiya AKPê dixweze dîtin û siyaseta xwe, li ser tevayıya welêt dîkta bike heta bi darê zorê be ji bi ya xwe bike. Bîrûbawerîyên din re tehemul nake û tu îmkanan jê re na-hêle. Di çareseriya doza kurd û Kurdistanê de ji ne rast in!..

Oposisyonên ku niha li Turkiyê ji derê hêzên kurda hene ji, di pirsa kurdî de ne samîmî ne. Dewletcî û kemalist in.

Çalakiyên ku ji bo parka Geziyê têr kirin divê meriv ji bo wan alîgir be, lê hişyar be. Hinek hêz û kesên kemalist û nijadperestên tirk dixwazin kurdan bi kar bînin!..

Ev du sal in li Suriyê xelkê serîhildaye û şerekî dijwar yê xof ku heta niha bûye sebebê kuştina ji 100 hezarê zêdetir û bi sedan hezar malbatên pêrişan û xezan li pey xwe hiştiye. Tesüreka mezin li ciwata kurd ji kiriye.

Heta van rojên dawî rewşa kurdên Suriyê baş dixuya, qet nebe, bi hev re şer nedikirin. Mixabin, çend bûyerên wê dawîyê ew rewşa xira kirin. Di demeka wiha de pêwîstiya kurdan bi hevkârî û wxewurtkirinê heye! Bûyerên bî vî rengî, ji aliyê kijan hêz an kesan ve bêt kirin divê raya giştî ya kurd qebul neke û ew ji li xwe rexne bigrên ku careka din ev nexweşîyên ku çedîbin dubare nebin. Ji aliyê din ve di medya "ciwaki/sosyal" wek *facebook*, *twiter* û *internetê* de ji kes an grub di şûna ku zimanekî nerm û rexnên erêni ku rê ji diyalogê re vekin, zimanekî dijminane ku tu xêra xwe ji çareseriyekê re nabe, bi kar tînin.



Ev hejmara ji dîsan nivîsên pênuşen bi we nas û yêñ nû ve hatiye dagirtin.

Muzaffer Özgür bi sernivisa *Kurdên Anatoliyê li Amedê bûn* di derbarê pêşengeha kitêban a li Amedê û herwiha gera xwe ya wir, hest û dîtinên xwe bi me re par ve dike. Birêz Amed Tigris belevokeka dîrokî ya Komîteya Îstihlas û Îttihad a Anatolî û Kurdistanê ku di salên 1926-27 an de hatiye belavkirin, bi pêşgotineka kurt wergerandiye kurmancî û li gel orijînala wê, ji ber aktualîteya rojê di vê hejmarê de hatiye weşandin.

Adem Özgür xortekî ji gundê Celika bi sernivisa *Li ser kurdî* niviseka balkêş, hem li ser serpêhatiyeka xwe û hem ji girîngiya zimanê kurdî nivisiye. Em bi vê xebatê Adem serbilind bûn û herwiha soz daye ku ji vira ha ew ê bi kurdî binivisine.

Bi hêviya ku ciwanên wek Adem Özgür ê bibin nimûne û xwedî li zimanê xwe derkevin havîneka xweş bo we hêvî dikim!

Kurdên Anatoliyê li Amedê bûn

MUZAFFER ÖZGÜR



Li dawiya 11 salêni li sîrgûnê şûn de dema rêya çûyîna min ya welat vebû, daxwaza min a çûyîna Kurdistanê jî

li ser milê min giran dibû. Lê min nedikanî xwe amadebekim û tekevim rêya welêt. Çend caran min li ber xwe de lê, ji ber çend pîrsên cuda bi serneketim. Ew xeyal û daxwaz di dilê min de wek agirekî mabû. Dîsa

jî min li ber xwe dida ku ez herim welêt. Îmkan çêbûn û roja çûyîna welêt hat.

Daxwaza Kekê Ali hebû ku li Amedê besdarî pêşengeha pirtûkan a TÜYAPê bibe. Me li ser we sohbet kir û biryar da ku em herin welêt, besdarî pêşengeha pirtûkan bibin û eger hat qebûlkirin, semînerekê jî



Foto: Esin Akgül Güneş



Jî seminera kurdên Anatoliyê dimenek.

Foto: Esin Akgül Güneş

Li ser Kurdên Anatoliyê bidin. Roj hat em di hemû planên xwe de bi serfirazî bi ser ketin.

Ez û Kekê Nuh ji balafirxana Frankfurtê di ser Ankara re firîn, ge-hiştin Amedê. Kurdistan ji bo min xeyalek bû. Ji bo karekî rewşenbîrî diçûm welêt. Lê çawa be, çi bibînim, kê nas bikim, tirs, şok û heyecan jî li ba min bûn.

Li ser balafirxana Amedê min fêhm kir ku cîyê leşkeriyê ye. Balafirên şer di cîhên xwe xûya dikirin û cemsên eskeri jî gelek bûn. Em daketin erdê. Dema min ji merdîwanê lingê xwe avêt ser a-xa welêt, min bi dengekî nizm got; "Bijî kurd û Kurdistan". Em derbasî hundir bûn û birayê me yê hêja parêzer, Levent Kanat jî li vir bû. Bi hevalekî xwe ve tevûhev ji bo karê xwe, ji Ankarayê hatibûn. Me ew

jî nas kir, parêzer Alper Doğmuş (ji Xelikan-Karacadaxê). Dema me hevûdu dît, ez gelek kefxwaş bûm. Em bi eynî balafirê hatibûn, lê me hay hevûdu nebûbû. Li der, li ber deriyê balafirxanê jî kek Ali û kek İbrahim Güçlü hatibûn me bigirin. Em şes kesên ji Kurdên Anatoliya Navîn li paytaxta welêt hatibûn ba hev, li ser pîyan me bîstekê sohbet kir. Me xatirê xwe ji Levent û Alper xwest.

Bi eraba Kek İbrahim em çûn mala birêz Amed Tigrîs. Mal a-va Kekê Amed ji me re mala xwe vekiribû. Me ew ji Swêdê nas dikir. Evarê jî kekê Mustefa Mih ji Berlinê hat xwe gehande me. Em evarê çûn parka li mehela Polatlarê. Me bi çend hevalan ve hevûdu dit. Kekê İbrahim Güçlü, ji kovara Vate Kekê Mahmut û Memoste Malmîsanij, ji



Foto: Esin Akgül Güneş

Mêrdînê kekê Hatip Xoce û çend kesên din demeka dirêj sohbet hat kirin.

Roja nû karê me yê pêşengeha pirtûkan dest pê kir. Pirtûkên me ji ber çend pirsên cuda dereng hatin. Me ji xortekî welatparêz li cîhê xwe hîşt û em çend saetan li bircên Amedê gerîyan. Reberê me kek Amed bû em ji bo kevnêşopiyêن bajêr agahdar dikirin. Balafirên şer gelek nizm li ser bajêr difiriyan, em bi xwe ji ecizbûn. Hevalan gotin; ew, hêz û hikumdariya xwe nişan didin!!!

Li pêşengeha pirtûkan cîvîna me ya li ser Kurdên Anatoliyê baş derbas bû. Nezikî 90-100 kes besdarî civînê

bûn. Moderatorê me Kek Amed Tigrîs bû. Kek Nuh Ateş, Kek Ali Çiftçi û ez ji axaftvan bûn. Zimanê civîna me kurmancî bû û ji bo Kurdi-Dimilkî û Tirkî ji bi rêya sîmultan dihate wergerandin. Me dor bi dor li ser mijarên xwe axaftinêن xwe kirin û bi rêya powerpointê ji resm, xerîtê û statistiken xwe nişan dan. Kekê Nuh li ser mijara *Dîrok*, *Koçberî* û *Ziman* axaftina xwe kir. Min ji li ser *Cîh û warê Kurdên Anatoliyê* agahdarî dan, li dawiyê ji Kek Ali li ser *Kovara Bîrnebûnê* agahdarî dan. Rojnamevan Haci Güneş û Esîn Akgülê (ji gundê Xelikan-Karacadaxê ye) ji ji aliyê resm û qayitkirina civîna me ve alikarî dan



me. Çi şans bû ku berpirsiyara salona me jî keçikeka me bû, xwendevana Zanîngeha Diclê bû û ji gundê Kırkısla-Cihanbeyliye bû.

Li ser standa me gelek heval û dost hatin, em dîtin. Serokê Şaredariya mezin ya Amedê Osman Baydemir û alîkarên xwe, Serokê BDP. Selahattin Demirtaş û hevalên xwe, Sosyolog İsmail Beşikçi û berpirsiyarên waqfa wan, Ragip Zarakolu û çend Akademîsyenên tirk, gelek nivîskarên kurd, rojnamevan û TV kurdan, kesên berpirsên siyaseta kurd û Kurdistanê, kesên Akademîsyenên Kurd, berpirsiyarên weşanxanan, xwendevanên Zanîngehén Diclê û Artûkluyê û gelek kesên din...

Evarekê Memosteyê Zanîngeha Dicleyê birêz Hasan Aslan em li mala xwe kirin mîvan. Bi amadekariya bermaliya Kekê Hasan û jîna birêz Kekê Beşîr me li wir kultura

aşxaneya kurdê Amedê dît. Mala wan ava. Ji xwarinê bi şûnda jî çend mîvanê din jî hatin û me li ser rewşa Amedê sohbet kir.

Me li pêşengeha pirtûkan cîvîna xwe ya ku bi navê APECê hatî amadekirin û li ser mi-jara **Giringiya Wergera Pirtükên Zarokan** jî bi serkeftî derbas kir. Moderatorê civîne kek Nuh bû û axaftvan jî Amed Tigrîs û Ali Çiftçi bûn.

Daxwaza me hebû ku em herin Mêrdînê bibînin. Kek Hatip Xocê em dawet kiribûn. Mustefa Mih jî daxwaz dikir ku here cem Kurdê me yên ji Başûrê Biçûk rewiyabûn û niha li Mêrdîne dijîn, ziyaret bike. Di nav wan de malbata xanîma wî jî hebû. Bi wan armancan çû erebeyek kirê kir û em çûn Mêrdînê.

Li Mêrdînê Kekê Hatip Xoce em kirin mîvan û bi rîberiya wî em li Mêrdîna kevn gerîyan. Bajarvaniya



Foto: Muzaffer Özgür



Mêrdin taxax nû

Foto: Muzaffer Özgür

bi hezar salan û şopên çandên li ser axa Kurdistanê me dîtin. Çandên gelên li wir jiyabûn ketibûn nav hev. Şopên olên wek Îzidî, Cûhî, Misilman û Hristiyan jî ketibûn hembêza hev.

Ji gera me bi şûn de, me bi çend kesan ve li buroya kek Hatip xwarinêka Mêrdînî (*samborek*) xwar, pir xweş bû. Tama wê hîn li ser zimanê min e. Birayê Kek Hatîp, Kek Nûrî em birin li Mêrdîna nû gerandin û agahdariyên balkeş dan me. Dema em ji Mêrdînê derketin ser rêya Amedê, dostaniyeka nû destpê kiribû. Mala wan ava...

Di wan rojan de, li Amedê civîna Pena Kurd



Déra suryaniyan-Mêrdin

Foto: Muzaffer Özgür

jî hebû û ez hatibûm dawetkirin. Wek prensib û daxwaz, min heval a-gahdarkirin û bi kek Mustefa ve tev û hev çûn cihê civînê. Çend seetan em li wir man û me ji wan xatire xwe xwest. Birêz Nivîskar Eyûp Kîran ji me re bû rîber û em bi creba nivîskar birêz Recep Dîldar çûn cihê pêşengetê û wegeriyan ser karê xwe.

Me bihîst ku Xecê (Yaşar) hatiyê Amedê, bi rîya kek İbrahim Güçlü me agahdarî girtin û evareke li parka Medyayê me hev û du dît. Xecê, em ji bo hatine binçavkirin-girtina xwe û rewşa Başûr agahdar kirin. Me gelek sohbet kir. Dema Bîrnebûnê dest bi weşanê bi-ke Xecê jî hatibû civîna Duisburgê, lê paşê ew çûbû Başûr û di berde-vamiye de têkiliyên me bi piranî qut bûn. Me got; Xecê tu bi xer hatî.

Roja dawiyê hat, me xatire xwe ji heval û dostan xwest û derketin rê. Li dawiyê Amedê ji aliyêkî de tesîrek li ser min hîst. Mala min ê! Amed paşda

maye. Şarederiya Mezin baş kar di-ke, lê têrê nake. Dewlet divê bi plan û projeyên taybet xizmeta kurda bi-ke. Tesîra şer gelek mezin e!..

Amed, paytexta welatê kurda... Bajarê mezin, heyfa te bû ku bi sa-lan e di bin zordariye de nalenal e!.. Kurd bi hêvî li benda çarenûsa pirsên xwe ne. Baweriya xwe bi utopya nakin, lê bêçare li benda aş-tiyeke mayende ne. Kurdan gav û daxwazê hatin kirin bi cih anîne, le dema dewleta dagîrker gavan navê, hîn ne zalal e, dê çi bibe. Lê xûya ye ku kurd ê li ber xwe bidin.

sorumluların projeleri
geliştiirdiklerini ifade etti.
Sayfa 8'DE

GÜNCEL
gazetesi
www.gunedeguncel.com
Fiyatı: 50 Ks.

'KÜRT ASİRETLERİ ASİMİLE OLMUS!'

Diyarbakır'da düzenlenen "Anadolu Kürtleri" adlı panelde konuşan şair Nuh Ates, "1700 yıldırın Dukan ve Campolattan olsı Kürt aşıretleri, Anadolu'ya gelip yerleşmişlerdir. Anadolu'ya gelen bu eski Kürt aşıretlerinin çoğu, bugün assimile olmuş durumdadır. Birçoğu da kendilerinin Kürt olduğunu ya bilmek ya da kabul etmezler" dedi.

4. KİTAP FUAR
BOOK FAIR
PESANÇEMA PÜRTÜKAN A-4 EMİR
18 - 19 Mayıs 2013
İzmir / Turquie

TARIHİMİZİ TANIMIYORDUK!

Diyarbakır 4. Kitap Fuar etkinlikleri kapsamında, Kongre Merkezi Konferans Salonu'nda düzenlenen "Anadolu Kürtleri" adlı panelde konuşan Nuh Ates, Kürtlerin M.O. 700 yılında Anadolu'ya geldiğini ifade ederek, "Eskişen kendimize

sadece Konya Kürtleri diyorlardı, çünkü tarihimi tanımıyorlardı. Bugün elinde, Kürtlerin Anadolu'ya M.O. 700 yılında ugradıklarına dair bilgiler bulmamaktı. Huri ve Mitânları, Hüdülerin başlığını ele geçirdiklerine dair tarihsel kanfları olduğunu gibi. Mardin'in de Küzilem'e nehrine dayandıran bilimmetke. Evet, kendimizi tanıtmak için artık Konya Kürtleri denemek yetmedi. Kürtlerin Anadolu'daki tarihlerini anlamak için, Kurt aşıretlerinin, Anadolu'ya yerleşmesi sekil ve sebeplerine bakmak lazımdı" dedi.

BİRÇOK ASİRET ASİMİLE OLMUS*

Kurt aşıretlerinin Anadolu'ya gelmesini, değişik tarihlerde ve farklı nedenlerden dolayı olduğunu kaydeden Ates, "Bu nedenlerin başında, kitlik, sosyal ve toplumsal değişimlerdir ya da başka bölgelerden pay kapına gidi nedenler olduğu gibi. Bizanslı ile Selçuklular arasındaki savaşta 'tanpon etnik grup' olarak kullandıkları bilimmetke. Anadolu'ya gelen büyük Kurt aşıret ve boyalar arasında Murki, Germiyan ve Lâk Kürtleri. Yine 1700 yılında Dukan ve Campolattan aşıretleri Anadolu'ya gelip yerleşmişlerdir. Anadolu'ya gelen bu eski Kürt aşıretlerin çoğu, bugün assimile olmuş durumdadır. Birçoğu kendilerinin Kürt olduğunu ya bilmek ya da kabul etmezler" diyerek konuştu. Haci GÜNEŞ'in haberî 9'DA

Belevokek

Îro (24.03.13) di rojnameya Haber Türkê de, Murat Bardakçı belavokeka dîrokî belavokê kir. Li bin vê belavokê navê Komîta Mekezî ya Îstîhlas û Îstîklal a Kurdistanê heye. Belavok bi orjînala xwe bi tîbên erebî ye. Lê tarîxa belavokê tune. Ev jî diyar dike ku ev belavok berî alfabe guhertina tîrkan hatiye nivîsandin. Tîrkan di sala 1928an de alfabeya xwe guhertine. Ji ber ku di belavokê de “Şêx Seîdê nemir” nivîsiye, ev jî diyar dike ku piştî şerê Şêx Seîd hatiye nivîsandin. Û destnîşan dike ku hîn şer bi temamî ranewstiya ye û cih bi cih dom dike. Dibe ku ev belavok di sala 1926 an 1927an de were nivîsandin. Min belavokê ji tîrkî wergerand kurdî.

Amed Tîgrîs

“Bismilahîrahmanîrahîm

Ey miletê kurd ê qebreman, ribê bav û kalên me yêñ pîroz ku di riya dînyayê de şehîd ketîne, ji bo namûsa xwe canê xwe dane û ji bo eşîretên xwe xwîn rêtîne, li ezmanan li me dinêrin.

Kitêba emanet û yadîgara Xwedê û yêñ ku li Anqerê şerîeta Muhammed alleyselam ji navê rakirine, ji İslâmîtê derketîne li hember wan û memûrên hukumetê, bav-kalên me yêñ şehîd dixwazin bibînin ka hûn ê çi bikin. Li gorî edetêne me yêñ netewî di nav livînan de mirin bêşerefi ye, ew dixwazin bizanibin ka hûn ji van edetêne me re çiqas sadiq in. Ji bo namûsa netewî û pîrozbahîya dînî yêñ ku destavêtîne tufengê û şer dikin bi teqdîr têñ qebulkirin û yêñ ku ji bo parastina canê xwe, rextê xwe ji pişta xwe vekirine û tufenga xwe teslîmê tîrk bikin, jina



Kurdistan İstiklal ve İstihlas Komitesi'nin
yayınıldığı bildiğin orijinali.

xwe cebren berdin, ji eşiret û miletê wî keçikan bigirin û bibin kerxanê û ji vê re riza nîşan bidin, kesên ku niha derketibin derî sînor jî, bi paş ve venegerin û neye hawariya gelê xwe bêhesiyet, xwînheram û şîrheram in.

Ji wan re dibêjin ku:

Xencerên ku we ji ber pişta xwe derxistine, bidin jinêñ xwe yên berdayî, tifungên ku we ji dest daye bidin keçen xwe yên ku kirine kerxanê, bidin ku we wekî mîran nikaribû namûsa xwe biparêzin... Şarik û melhefîn wan jinan bavêjin serê xwe. Bigirîn, hûn ê bibînin ku ew çawa namûs û dînê xwe rizgar bikin!..

Tirs berî mirinê nagirê. Heta ecelê mirov neyê, mirov nami-re. Yêñ ku Xwedê yek û Muhammed aleyweselam peyxember dinasin, ji suyê “av” û ji ekmekê re “nan” dibêjin biryar dane ku hukumeta Anqerê îmha bikin.

Bela û felaket weke siya mirov in. Hûn ciqas birevin li pêy we têñ. Di destê we de tufeng û di çokê we de hêz heye, weke keriyêñ miyan ku dixin mezbehê serê xwe ji kêrê re dirêj nekin!.. Li ben-da ecelê xwe nesequinin!..

Ev helwest ne layiqê şan û şerefa miletê we ye. Kirinêñ ku li serê welatî û dîndaran dîkin li ber çavêñ we ne. Îro dora wan e û sibê jî dora we ye. Di dema serhildana şêhidê nemir Şêx Seîd de, Axayêñ wekî Cemîlê Çeto, Emînê Ramanî, Hacoyê Mîdyatî, Resûl Zîlyanî û Huseyn Paşayê Heyderanî û gelekêñ din, piştre muameleyêñ ku anîn serê wan li meydanê ye. Ji wan ibret bigirêñ. Ji hukumeta Tirk a iro re bêdengbûn, itîatkîrin yan jî alîkarî kirin fê-de nake!.. Pêwîst e ku hûn xwe ji taqîb û zilma hukumetê rizgar bikin. Çareya rizgariyê desthildana çek e. Hin li gelek ciyan şerê dijwar dom dike. Hukumet vê şer û berxedanê ji we vedîşêre. Qet nesequinin, bi hevdu re têkîlî dayînin. Eskerên herêma xwe dîl bigirin. Bi hawarî û alîkariya birayê xwe yên kurd ên ku wekî şêran, şer dîkin, bigehîn. Bi mehan e ku Lazistan di nav agir û xwînê de ye. Neferên tirk ên dîndar, gule navêjin birayê xwe û teslîm dîbin.

Kelkê tirk ên dîndar bi dilê xwe bi we re ne. Kesên ku li Anqerê desthilatdariyê girtine destê xwe, li dijî îmhanaya kur-

dan dixebeitin. Ev dixwazin têkoşîna me kurdan berevajî bikin û gelê Anatoliyê bixapînin. Naxwazin qebûl bikin ku şerê netewey- eke mafdar û rewa tim bi serdikeve. Top, tufeng û muhîmatên ku hûn ji destê tirkan bigirin têri we dike. Muhammed sallahu aleyweselam alîkarê me, Allah Celle Cellal bi me re ne û em qat bi qat ji hukumetê xurtir in. Hemû dinya bi vê yekî dizane. Ji xefletê rizgar bin, şiyar bin. Dest bidin hev, dema hûn yek bin, dê gelek kes besdarî nav hêzên we bibin. Hûn dê gelek mirovên muqtedîr û manûskar bibînin. Dema hûn İslama muqades, rihê pêxember, heq û rûhê milî qezenc bikin rihêecdadê we yê Medi şad dibe û îspat dîkin neviyêwan ên sadîq û layiq in.

Komîteya Îstîblas û Îttîhad a Anatolî û Kurdistanê

Komîteya Îstîblas û Îttîhad a Kurd van biryarênen jérîn girtiye:

- Komîteya Kurdistanê ne alet û destikê tu dewletî ye.
- Armanca wê bidestxistina mafê netewî ye. Ev ji:
- *Hidûdê milî divê were diyarkirin. Di kar û xizmetên hundirîn de heyeteke xwe yê birêvebiryê hebe.*
- *Di nav sînorê milî de zimanê kurdî fermî were qebûlkirin.*
- *Memûr ên xwe bin.*
- *Rêexistina jandarman aîdê kurdan bin û bi mebûrênen kurd ve girêdayîbin.*
- *Esker û seresker di nav yek artêşeke de, lê her kes bi ziman û çanda xwe perwerde bibin.*
- *Heta em negehîn armanc û daxwazên xwe şer berdewam e.*
- *Mesûlê xwînrıjandin û zerara hundir û der hukumeta Enqerê ye.*
- *Komîte ji bo muzakereyan her dem û li her cihî amade ye.*
- *Xwîn ci qas zêde were rêtin, şertên kurdan ji li gorî wê girantir dibe.*

Komîta Mekezî ya Îstîblas û Îstîklal a Kurdistanê”

Teşî ristin

Amedekar: Nesrin Bayram

Çavkanî: Fatma Mert Sütcü ji Celebê

(Fata Mehmađî Îboyî Xezdalî)

Her sal di demsala havînê dema birîma pêz e ku jê re dibêjin “dema pezbirê”. Ên ku pezên wan hebin bi alîkariya hevdû, bi meqesên taybet ku jê re dibêjin “hevring” pezên xwe dibirin.

Piştî ku pezên xwe birîn hiriya xwe dişon, li ber tavê radixin û zûwa dikan. Paşê kom dikan dixin torbeyan û hildidin...

*(Hiko hevrînga xwe hildide diçê alîkariya Zeko, Zeko jî hevrînga xwe hildide diçê alîkariya Hiko...)

Piştire demê xermanan, jin hiriya xwe li şê dixin û paqij dikan. Şeyê hiriye textek e ku dirêjbûna wî herî kêm nîv metro ye û li ser aliyekî wî textî û bi qasî 20-25 santiman şîşkên biçûk tê de dikutin û pê hiriye şe dikan. Yanê her carê hinek hirî hildidin û li nav wan şîşkan re derbas dikan, hiriya han ji hev vedibe û çi qırş û tiştên zêde tê de hebe ji nav derdikeve û mîna pembo nerm di-be. Helbet di pezbirê de mîr alî hev



dikin lê di şûştin û şekirinê de jin alîkariya hev dikan.

Piştî ku hirî tê şekirin, dikan gilokên mezin ku mezinbûna wan qasî 50-60 santiman dibe.

Dema hiriye dikan gilok, qalîteya wê jî tê kifşkirin. Bi giştî sê cure hirî hene:

1-Hiriya duta ji tayêñ zirav pêk tê û ji bo kemerên hirî, kinc û xaliyên tenik bikar tê.

2-Hiriya nex hinekî ji hiriya duta stûrtir e û ji bo çekirina telîs, werîs û çuwalêñ mezin bikar tê.

3-Hiriya sê nex Ev piranî ji bo çekirina kindirên stûr û girêdana a-jelan bikar tê.

Piştî ku cure û qalîteya hiriye hat kifşkirin, bi teşiyê dirisin û li gor xwestina xwe, zirav yan stûr dikan û

paşê jî ji bo rengkirinê hazir dikan. Boyaxcî ji bo karê rengkirina rîsên ku hatiye ristin, tên ba hev û gund bi gund digerin û rîsê hemû malan reng dikan. Di dema rengkirinê de ji rengê vekirî dest pê dikan û herî dawî jî rengê tarî lê didin. Piştî rengkirinê rojekî didin ber tavê û baş zûwa dikan.

Helbet ji bo çêkirina doşek û lihêfan hiriyê dikutin ku jê re dibêjin “şivkirin”. Dema hiriyê şiv dikan hirî ji hev vedibe û ji bo çêkirina doşek û lihêfan amade dibe.

Heftreng: jinek dikare di nav 10-15 rojan de du tejan û di 30 rojan de jî sê tejan çêbike û van tejan li pey hev û bi rengên cuda bi hev re girê bide û navbera wan de jî bi qasî çar tiliyan tengên din bavêjê.

Bedeni; di çêkirina bedeniyê de rengên mîna hişin, spî û sorê tarî tê bikaranîn û ji bo xemilandinê jî flikeyan pêve dikan û xane xane çêdikin.

Bedeniyek 2*2 di nav 25-30 rojan de tê çêkirin Yek 1*1 jî di nav 10-15 rojan de tê çêkirin

hev tên rêzkirin.

Xêlî; tenê ji bo xemilandina dîwaran tê bikaranîn.

Çalê balingan jî mina bedeniyen tê çêkirin. Dev û kêlekên wê bi toqazan tê xemilandin û tê neqîsandin. Kincêna paqij û qetkirî dixin nav wan çuwalan.

Ekîw û têr:

Têr bi giştî mina balîfan tên çêkirin û tayên bi rengên tarî tên bikaranîn. Aliyên têrê yên ku dikeve ser pişta dewaran bi çerm tê pêçan û bi çerm tê dirûtin.

Balîf; 12 yan jî 6 lib tên çêkirin. Li ser balîfan neqş tên kişandin û li nav wan neqşan de çîrok û gotinên pêşîyan tên nivîsandin. Her wiha li ser wan wêneyên gul û fêkî û tiştên rengin çêdikin. Piranî rengên hişin, kesk, spî, sorê gevez, hişinê tarî bikar tên.

Tevn:

Ferat, birek, pîj û kirkit ku ji hesin tê çêkirin

Risavtin: befs ji texte tê çêkirin

Banî; di xemilandinê de neqşen reng bi reng tên bikaranîn. Mînak, poz xarik bi awayekî sîmetrîk yanê li pev

Li ser kurdî

ADEM ÖZGÜR

Ez biçük bûm. Em diçûn dibistanê mamoste ji me ra digot “*kê bi kurdî deng kir, hun werin ji min ra bêjin.*” Hîn li dibistanan em dikirin wekî ajan! Çend car, min li dibistanê bi kurdî deng kir, mamoste bi guhê min girt. Min ew rojanañ tu bîrnekirin!

Ez li Anqareyê diçûm lîsê, sinifê de ji min bêtir wekî din kurd tûne bûn. Min li wir qedir û qimeta kurdî zanî. Ez hîn pazdeh salî bûm, çend mehan li dibistanê bi tirkî deng kir, welle ku dema kesekî bi tirkî deng dikir ez aciz dibûm. Min dixwest ma dibistan tewa be, ez herim gundê xwe, nav heval û cîranêñ xwe bi zimanê xwe biaxivim! Meriv ji zimanê xwe dûrket, ev tişteki pir zor e!

Dîsa li Anqareyê, ez li balafirgehê, li benda meta xwe bûm. Ew, ji Almanyayê dihat. Min di telefonê de bi kurdî deng dikir, polîsek hat, got; “*tu çi deng diki? Ka cûzdanî xwe bide min*” Ez birim ber duwarekî, nizanim çend şîret li min kirin! Navê min û nimreya min li kaxizê nivîsand û ez berdam...

Min tu tişt fêhm nekir, min di telefonê da gotibû: “*hîn meta min nehatiye*” ev bû!

Ez li sala 2007an bi xwandinivîsandina kurdî hîn dibûm. Di komputûrê min da ferhengeke kurdî hebû. Rojekê polîs hatin mala me, di komputûrê min da ew ferhenga dîtin. Polis, ji min ra got: “*Tirkî bi te nake tu bi kurdî hîn dibi?*” Min jî, ji wî ra got: “*Na, tirkî tenê bi min nake!*” Polîs, hêrs bû û wiha got: “*Li ser çokê xwe rûne û dengê xwe dernexe!*” Ez li ser çokê xwe rûneniştîm, lê min tu deng nekir!

Ez birim navçeya Kuluyê, li wir ez di lêpirsinê da bûm. Çend saet ajotin nizanim. Polis tim ji min ra digot: “*Tu nizani bi kurdî bixwûni, lê tû siyaseta kurdî dikî û li mala te rojnameya kurdî tê dîtin. Ew çi hesaw e?*” Min jî got: “*Welleh tu rast dibêjî, ez nizanim bi kurdî binivîsim û bixwînim; ji ber ku we nehîst ez hîn bibim. Yek jî, hûn him dibêjin kurdî qede-xe ye, him ji dibêjin tu çîma zimanê dayîkê xwe nizanî. Ya we çi hesaw e?*”

Ez di zindanê de bûm, heşt rojên min mabûn ku azad bim. Min xwest

bi réya telefonê bi bavê xwe ra bêjîm vê rojê, vê saetê werin. Li pêş pasevan (gardiyâ) deng kir û paşê telefon da min, ji min ra got: "Tê bi tirki deng bikî, ji ber ku kurdî qedexe ye." Min qebûl nekir, min jî wi ra got: "min tu car bi dê û bavê xwe ra bi tu zimanê din deng nekîrye û deng jî nakim! Tu bi ci maftî nahêlî ez bi kurdî deng bikim?" Wî heq-hiqûq rez kirin: *nabe, tu nikani bi kurdî deng bikî...* dirêj kir li ber min...

Ez î hinek serhişk im, min guh neda şora wî, min nîvî bi kurdî, nîvî bi tirkî dê û bavê xwe ra deng kir. Pasevan li min mezekir, got: "Dema ji te ra ceza hatî tê bibîni!"

Heyşt rojên min, tim li ser wî cezayê bûn, min xwe bi xwe digot îro an ji heta sibê ceza ji min ra we-re. Lê tu ceza nehatin!

„Perwerdeya kurdî her dem li Tirkîyê qedexe bû. Îro, dersa hilbijartî der-xistin pêş kurdan. Ev imkana tiştekî nade kurdan! Min hîn tu kes nedît bi kurdî fêr dibe. Em di televîzyonan de dibînin xwendakaran fêrî Quranê an jî jîyana pêxemberan dikin. Lê çima kurdî nêhilbijartin?“

Ji ber ku hîn fikra dewletê li ser asîmîlasyonê ye! Nahêlin ma zarokêñ kurda bi zimanê xwe hîn bibin. Ma ji bo ci zarokan di pênc an jî şes saliyê da dişînin dibistanan?

Ma kurdêñ Anatoliyê li dibistanan bi zimanê xwe fêrbûnê bixwazin, ka em bibînin ê dewlet ji dil vê qenûnê çêbike an ew jî siyasetake derewin e.

Ez, nezikî pênc sal in dinivîsim. Li ser edebiyatê, dîrokê û siyasetê...

Min li ser her mijarê nivîsand. Li ser jiyan û doza kurdan, li ser dîrok, ziman, çand û kultura kurdan jî nivîsand. Lê van nivîsêñ min bi tirkî bûn. Ez dixwazim edî bi kurdî binivîsim û bixwînim.

Çêrok, çand, kultur û dîroka Kurdêñ Anatoliyê bi kurdî dixwazim binivîsim. Ev ji bo min tiştekî pir dewlemend û birûmet e!

Ez êdî nivîskarê Bîrnebûnê ji dixwînim.

Ji bo xortêñ kurd ên Anatoliyê gotineka min heye:

Kurdno, dost û hevalno!

Bi kurdî biaxivin.

Bi kurdî binivîsin û bixwînin.

Bi kurdî bifikirin!..

Rêzenivîs:

ŞOPÊN DEMA XATIRXWAZTINEKÊ

-IV -

NUHÊ HECÎ MALÊ HERŞÎD

Li ser rêya berve xerîbiyê

„Simo, bi ïznê Xwedê, em ê pêçekê bi şûn da bi Anqereyê gihêni“, Homer got û da ser:

—Em ê li wir herin mala Kirto, îşev bibin mêvanê wî. Ew hevalê min û eskerî ye û xalê Meço ye. Min bi rê da ji te ra qalkiribû, ez bi Meço va li Elmanyayê di malekê da dimêni. Dora dine rê, em ê danê siwe li tîranê siwar bibin û herin Stembulê, di wir ra jî berê xwe bidin xerîbiyê, berve Almanyê bi rê kevin.

Otobos danê êvarê gihêste paytex ta Tirkiyê, Anquerê. Anqere bajarekî kevn e û çaxên berê bi navêna mîna Angure, Angora, Ankyrî dihata nas kirin. Ew raste pir destdirêjayiyan hatibû. Di qirneya entîk da cîhûwarê hatî û hêtîya bû. Dûv ra, li hêla Gordiyonê, bû bajarekî ji yên dewlette Frigiyayê şen û avadan. Di pêy va, romayıyan dest dan ser û ew kirin paytex ta parêzgeha xwe ya bi navê Galatya. Paşê kete bin destê selçûkî, osmanî û moxoliyan. Di çaryeka esra 20an da bû paytex ta Tirkiyê.

Homer û Simo li gerejekî oto bosa yê nêzikî taxa Ulusê dêhatin. Bavil û çiqin di destâ, li nava bajêr teve qerebelixeke ku ji Simo va mîna mehserê xay dikir bûn. Însan mîna xwelîyê bûn, li devhev diqelisin.

—Simooo, va dera Ulus e haaa!

Bi vê gotinê Homer xwazt ku Simo hayadar bike. Lî wî ev bi dengekî bilind û awayekî weng got, mîna ku bibêjî, ew i dixwazê ku mîzgîna bajarnasiya xwe li guhê Simo bixe.

—Va qerebelix û hewlîyê weng ci ye looo, walle meriv ê xwe li vir wenda bike! Simo bi matmayî got. Lébilem tirs lêniştibû, sewa ku di nav qerebelixê da Homer wenda neke, wî pir bi dîqet li dorûpaş xwe mîz dikir. Ji hêla Homer vi dûr nediket û çavêna xwe ji wî banedidan.

—Tu berê qet hatibûyî Anquerê? Homer ji Simo pirs kir.

—Careke tenê hatim. Di şanzdeh saliya xwe da bi bavê xwe ra hatim. Me pez anîbû ku li ida qurbanê bifroşin. Em ê li der bajêr bûn, daneketin nava bajêr.

“Aha vayî han peykerê (heykelê) Atatürk e!” Homer meyla Simo kışand. Peykerekî mezin, bi heybet, bi kincên eskerî û ji rengekî tarî. Li pêşîya peyker inzibatên şîp û ştandî yên nobedar sileh li ser mil mere-sima dewrkirina nobedariyê birêva dibirin. Şekla gavavêtina wan ya bi teperepeke bi hemd mîyla xelkê dikişand. Ji sêydaran henan xwe rep kiriwûn, mîna eskeran li silava Atatürk dawestibûn.

Simo jî bi heyranî li peykere Atatürk mêz dikir. Ew jî yek ji qurbaniyê propagandeya dewletê bû. Li gore wî, heye tuneye, Atatürk heye. Di ser wî ra serok tunin. Wî welat ji bindestê gawiran xelas kiriye û cumhuriyet ava kiriye. Û wî beriyê welêt berve Awrupayê kiriye. Li her derê û di ber giştkan jî li mekteban gotin û kirinê Atatürk mîna ayet û ayînên pîroz dihatin viberxistin. Her tişte wî yê şehsî û malbatî jî. Hetanî ku bi tarixa xwedêdan û mirina wî û nimreya merasên (solên) wî gihê vi ber telebeyan di-xistin. Simo jî li mektebê nav û tarixa “şoreşen” ku li ser navê Atatürk tênen heldan ezber kiribûn. Wî bi rîya hezar carî dûbarakirina çekirina resmê Atatürk, dev û lêv, çav û poz, brû û bijang, henî û çengê, gep û guh, welhesil her xet û nixteyeke

devûrûyê wî di serîyê xwe da pît bi şûn kiribû. Ji hêlekê da jî mamhos-teyan bi aferim û bi comerdî belav-kirina puanê bilind telebe teşwîqe çekirina resmê Atatürk û yarêbûna ji wî dikirin. Yê ku resimê Atatürk rind çênedikirin û xwe li heldana nimreya merasên Atatürk şaş dikirin bi puanê kêm û kutkirinê diha-tin cezakirin. Tu derêن umumî yên ku resimê Atatürk pêdanekiri û yan jî peykerê wî lê nehatiyê danan tu-ne bûn.

Li Anatoliyê, piraniya xortêñ kurd yên xwandeke û di çaxê Simo ra heyranê Atatürk bûn. Her çiqas ku wan di nav xwe da xwe kurd bi-hesibandana jî, li derva û li derêñ umumî, eşkere xwe tirk dihesibandin. Wan hay jê siyaseta hêlandin û tunekirina ziman û tarixa kur-dan nebû. Li Beraniyê, gundê ku Simo li mezin bûyî, jî tore û kulta-ra xwandin û nivisîna bi kurdî tune bû. Xelkê kurd yê li nava Anatoliyê hetanî wê demê ji zanîn û hêsên mileti dûr bû. Li wir nasnameya eşîrtî û malbatî li pêş bû. Meriv li wir pir caran raste gotina, “erê, em kurmanc in, lê tirkê esil em in!” di-hat. Lowma xelkê vê derê li dijî qe-dexekirin û cezakirina dengkirina kurdî bi taybetî li mektewan derne-diket.

Simo bi çavêن belkirî li peyker sêyr dikir. Pirtir jî li seriyê wî. Ew lê digeriya ka xetên devûrûyên peyker bi yên resmê Atatürk ê kû wî di seriyê xwe da cemidandibû va hevûdu digirine yan na. Pêçekê bi şûn da, dengê teperepa inzîbatê nobedar kêm bû. Simo û Homer, ji herda peykerê Atatürk vi dûr ketin.

Hîngê heyamekê sîyasî i lihevketî dagirtibû ser paytexta Tirkîyê. Dema serhildan û liberxwedanê telebe, karkir û gundiyan bû. Şerê hêzên çepparêz li dijî imperyalîzma Amerîka û hevalbendên wê yên li nava Tirkîyê û bi hêzên rastparêz va jî her ku diçû şen dibû. Herro bûyerên bi xof û xwîn diqewîmin. Pêl û pêtîyên şoreşê ji ser bajêr heldihatîn. Li meydan û cadeyan, di nav qerebeliyê da meriv li wir û li wê raste jendirmeyên ku si-leh li ser piştê û bi lez û bez dimeşîyan dihat. Nav û dengê serdarê serhil-dana telebeyan, Deniz Gezmîş li her derê belav bûbû. Wê demê, ew idolê pir xortan bû. Him hezkir û him ji dijminên xwe pir bûn. Ji avûrûyên van qewimî û rûdanêni bi şîdet û xwîn, behsa wê dihate kirin ku es-ker dest deynin ser idareya welat û hefsarê hikumdariyê têxin destê xwe.

Homer û Simo berê xwe dan me-heleya ku Kirto lê rûdinişt. Bi rê da dibûn guhdar û sêydarê deng

û tonêñ binatî yên jiyana bajêr. Tepe-repa merivan, teqereke wesa-yitan, guregur û virervira motîren tomafil û kamyonan û duteduta qurneya wan, leqeluqa nalêñ hespêñ arebe û paytonan, bang û wêrîniyên firoskarêñ seyare û banga nimêjê li hev diqelîfîn û dibûn girmineye-ke mezin, dengqelêriyeke ku me-riy ji ber nedihewî. Bîhn û bex-eke bi tîn ya ku ji xan û kargehan, ji rix û mîza hespan, ji şevata benzin û mazotê û ji qelêriya bajêr heldihat jî dibû mezaya vê dengqelêri ye. Meriv bi vê girminî û kokteyla bîhnûbexê diwestî, xişûxal, kerr û gêj dibû. Di nav vê dor û nefestengiyê da, gund kete bîra Simo, bîhnferehî û xwaş-haliya ku ji bêdengî û xewleyîya li gund belav dibû, dihate ber çavêñ wî.

Piraniya qerebelixa li cade û mey-danan mîr bûn, mîrêñ can. Li wir û wê meriv raste jinan jî dihat, jinêñ bi kincêñ modern, porzerkirî û lêvsurkirî jî. Her ku Simo raste jin û mîrekî ku bi destê hevûdu girtî, şabûn û bextiyarî ji rûyên wan belav dibû dihat, yara xwe dikete bîra wî, yara xwe ya paşê bûbû para xelkê.

Devdeva êvarê ew gihêştin mala Kirto. Mala wî li bewrarî girikekî bi-lind bû. Bi barêñ di destâda, ew bi he-lehel û kelekel bi vî girikî da hilkiştin

û di bin xwîyê va bûn. Kirto zûva bûku li Anqereyê rûdinişt. Di dezgeha agirkûjiyê (îtfayê) da dişûxilî. Xaniyê ku ew tê da dima “gecekondu” yeke ji goz û meweyniyekê piçûk bû. Çima ku wê çaxê kesên xizan ji neçariyê avahiyê xwe bê miseda, bi dizî û bi şev çedikirin, jê ra bi tirkî digotin, “gecekondu”. Kirto di vê avahiya bişevdanayî da bi kirê rûdinişt. Şevavahiyeke bi dîwarên xilûxar û qeliştî bû. Ku te ji derva da lê mêt dikir, tê bigota, ewê bi amene- ti çekirine. Ji hundirê malê bîhna bermayıyên şîv û xwarinên şevnistî û xwiya meriva dihat.

Ji xwarin û vexwarinê bi şûn da Kirto bi Homer va rabûn ser xwe, ku herin derva. Di ber derketinê li ber dêrî Kirto got, “Simo, ez bi Homer va herine derva, pêçekê li çayxanekê rûnin, bi tawle bilîzin. Tê dil heye, tu jî ware!” Simo ji dereng teklikirina Kirto viderxist ku ev teklifeke ne ji dil e. Him jî westiya bû, ne dix-wast derkeve derva. Lowma got, “na, hun herin ez nayêm, tu sax bî!” Kirto bi lez da ser got:

—De tu dizanî, tu î bi dilê xwe yî. Ha, hendik ma ez ji bîr bikim, cîranekî min î telebe heye, ez ê niha li ser deriya xwe xewerê bi wî dim, ma were ba te, dişliqî wê bi hev we-re. Navê xwe Îbram e, lê min na-

ve, “Dediko” pêve kiriye. Tê biwînî, egîtekî li ser xwe ye, tirsê nizane! Pir zana ye, hay jê her derekê heye.

Simo gavekê li mala Kirto bi tenê ma. Wî çav li dorûpaş xwe, li diwarên reperût yê odeya ku ew lê rûniştibû gerand. Tenê şalekî kûn bi pînê yê ku bi diwarê li armance wî da hatibû bidardekirin vi ber çavên wî ket. Pîne di çend deran da quî bûbûn.

Pêçekê di pey çûyîna Kirto û Hommer va, Îbram hate ba Simo. Li halê hev pirsînê û xwe bi hevdü dan naskirinê şûn da ew ketin nav sohbe-teke tîr, dûr û dirêj.

—Te got, navê te Îbram e. Çima Kirto bi te ra dibê, Dediko? Simo ji Îbrêm pirs kir.

—Qe qalê meke, xalê Kirto merivekî yarenîhez e. Ez tim jê ra qala Dedekoyê (DDKO) dikim. DDKO kurtkiriya navê rîexistina kurdan yê bi tirkî “Devrimcî Dogu Kultur Ocakları” ye. Ez jî demezranê û çalakvanê wê me. Lowma wî nave Dediko li min kir û bi vî navî bane min dike.

—Armanca DDKOê çi ye, hun çîr dikine? Simo jê pirs kir.

—Em dersan li ser tarix û edebiyyata kurda pêşkêş dikin, mîting û meşan li dar dixin, daxwaze heqê kurdan dikin. Didin zanin, ku kurd

miletikî bindest e û welatê wî hatiye bir û belavkirin. Ew î ji heq û huquqan vêpar hatiye hîsttin. Ziman û kultura wî bendkirî ye. Ew î di nav xizanî û nezaniyeke kûr da hatiye hîsttin...!

Gotinên Îbrêm mîna brûskê li mejoyê Simo diketin û jê pirs û şık dipekandin. Ew li armancê zanîn û hayadarbûna Îbrêm mat mabû. Malumat û navlêkirinên ku wî qet hay jê nebûn dibihîstin. Îbrêm bi ser da rexne û lomeyên giran li Atatürk dikirin. Wî ew bi neyariyên mezîn gunehkar dikir. Ew mîna reberekî nas-yonalist yê ku temelê biçûkxistin û tunekirina miletê kurd danayî diwesi-fand. Lî Simo Atatürk mîna rîberekî jîhatî û qehraman yê ku serokatiya şerê serxwebûniya Tirkiyê kirî û rî li ber jîyanke modern û berî ber-ve rojavayê vekirî nas kiribû. Lewma bi rexne û lêdanên Îbrêm yê tûj serê wî tevlihev bûbû. Ew ji nav vê tevliheviyê dernediket û jê nedihat, ku tiştekî bibê yan jî bersivekê bi Îbrêm de. Resimê Atatürk yê di serîyê wî da şeli û qerçimî bûbû. Gewriya wî zîwa bûbû, xwêziya xwe dadiqultand.

Îbram kurmancê Anatoliya bû, ji eşîra balekanîya bû. Telebê zanîngeha huquqê bû. Wî bi ar û alavekê ji Simo ra qala tarîx, e-deb, serhildan û berxwedanên kur-

dan sewa azadî û rizgariya kurd û Kurdistanê bi taybetî jî ya di bin serdariya Barzanîyan da kir. Şîret li Simo kirin û got:

-Li Almanya, li welatên Awrupa rêxistinên telebeyê Kurdistanê he-ne. Pêşnîyaz û temeya ku ez li birayê xwe bikim ev e: Ku tu çûyî wira, xwe bigîhine wan.

Ji bêdengmayineke kurt bi şûn da, Simo xwazt ku mijarê biguhere û ji Îbrêm pirs kir, got:

-Navberê te û Karto çîng e?

-Rind el Merivekî şen û şâ ye! Tozikê gumerê ye, ku dînyê xerav bibe jî ne xema xwe ye! Merivekî şorxwaş, yaranîhez û destfereh e. Ez î pê xenê me ku cîranê min e. Tenê bi duxinê xwe ew î xerew e. Halbukî li gund jî bi du jina ye, dîsa jî tim çavî li pêy jina ye. Tim diherê ba jînen ku dewara xwe bi canfiroşiyê dikin. Bi tehmînê min, ew î nivî maşaş xwe li vê rî xerc dikê. Kî dizane, he-re ku hîro jî ew bi Homer va çûn ba jînen canfiroş.

Simo di pêy sivikkenekî li ser rûyê wî, got:

-Heyret, Homer jî bi rî da qa-la duxinsistiya xwarziyê wî yê li Almanyayê, Meço dikir. Mezina go-tiye, xarziyê li xala herin, herhal Meço jî ji vê mîlé da li xalê xwe çûye.

Kirto û Homer pir dereng, ji nîvê şevê bi şûn da hatin. Wê şewê Simo nenivist. Devdevê siwê pêçekê çav nerm kirin, ewqas.

Dora dine rojê, Homer bi Simo va bi paytona cîranê Kirto çûn gerajê tîranê. Bi rê da, Homer pîrsî:

—Dediko bû, çi bû, ji tera qala çi kir?

—Dediko, qe qalê meke, waaa, heyfa wî, bi çiqas tiştî dizanê lo, der-yak e, derya! Qala tarixa kurdan, neheqî û neyartîya ku li wan hattiye kirin. Qala rêxistin û kovarê kurd yê ku çel-pence salî di ber vê hatine avakirin kir. Navên wan yêni bi kurmancî heldidan, navên ku me qet nebihîztime, „Kurdistan“, „Rojî Kurd“, „Azadî“, „Xoybûn“ (xwebûn)... Simo bi dengekî nizm bersiva Homer dida, nedixwest ku xwediye paytonê gotinê wî bibihîze. Homer xwazt ku Simo şiret bike, got:

